

Labîrenta Cinan

îbrahîm seydo aydogan

1

Rêka ku mamoste Kevanotê serlehengê romana Hesênê Metê dê bide ser, bigihîje gundekî seyr û tê de li labîrentan rast were, bi bersiveke fermî ku ew jî serê salekê ye ku bi dilpekîn li bende ye dest pê dike. Ji bo Kevanotî dê jiyaneke nû dest pê bike an jî jiyaneke nû bi dawî dibe.

“... bi tirseke bênav diricîfe û dixwîne, piştî xwendinê êdî bi çavên xwe jî ewle dibe ku ew, wan tiştên li ser kaxezê rast dixwîne, ji nişka ve tiştêkî wek tîrê xwe di serê wî de ba dide, ricifîneke bêmane bi laşê wî digire, dilê xwe bi xwe dişewutîne, lêvên wî dilerizin, av bi çavên wî dikeve û di dilê xwe de (dibêje), rast e, ez bi kêrî hîndayînê nayê.” (r.5)

Bandora ku ev bersiv li Kevanotî dike jî, ne gelekî bi kêtekî be jî, hatiye ravekirin ku ev taybetmendîya pêwîst di gelek romanên kurdî de nayê dîtin. Bersiva ku jî Kevanotî re hatiye, neyînî ye; elbet, ev bersiva neyînî ne bi dilê wî ye, lê Kevanot bi xwe jî heq dide vê bersivê.

“... Serê min bûye wek hêkeke genî, tevgerên min êdî ne tevgerên mamosteyekî ne. Lê ez anuha têdigêjim.” (r.5)

Erê, Kevanot heq dide vê bersiva neyînî û ew bi xwe jî baş dizane bê ji bo çi ew nema bi kêrî hînkirinê têt. Sebeba wê jî dîsa ew bi xwe dîyar dike.

“Ew gunda... av û kûçên wî gundî...” (r.5)

Li vî gundê ku Kevanot naxwaze navê wî bide hin bûyer hatine serê wî ku bûne sedema vê rewşa wî û bivê nevê, gava ku li ser sedema vê bersiva neyînî dirame, hemû tîrê bîra wî.

“... wê kaxeza bersivê hêdîka datîne kêleka xwe û bi raman vedigere ser wan salên xwe yên bihuri.” (r.5)

Kevanotê serlehengê romanê, piştî vê hevokê vedigere salên xwe yên wî gundê ku behs dike û roman hê nû di beşê duyem de dest pê dike.

Di beşê duyem de em dibînin ku Kevanotî jina xwe ya ciwan, Nergisa koçer, daye kêleka xwe û di “kevneteqşîya” xwe de berê xwe daye wî gundî. Romannivîs vê bişûndevegerê weha rave dike:

“(...) çar sal, rasterast çar sal berîya nuha (...)” (r.6)

Di rêyê de di nav dîyalogên Kevanotî û Nergisê re, ku li ser hev naskirina wan û zewaca wan in, hin hûrgilîyên navkokîyên jiyana koçerî û bajarvanîyê jî dide û rave dike bê di gava zewaca wan de ji ber van navkokîyan çi asteng derketine pêşîya wan.

Nergis koçer bi şayeseke weha ku li nav rûpelan hatiye belavkirin têtê vegotin:

“(...) di vî salê xwe î hîjdehî de ew jî weke gelek keçên koçer ji hinek aliyên jiyanê bêpar e: çûye bêriyê pez dotiye bêyî ku guhanê wan bêşîne, lolep di dest de dew kiyaye bêyî ku meka wê çilkan bireşîne, bêyî ku mast tirs be şîr eywan kiriye... bi kurtî mîna seriyek penêrê koçerî, xwediyê dilekî pak e û spî ye (...)” (r.8)

“biskê wê î kej” (r.8)

“pişirînên zarokane...” (r.8)

“çavên gir” (r.8)

“rüyê şermok” (r.9)

“bergeheke wusa kûvî ku...” (r.12)

“jî bilî zimanê malê bi zimanekî din nizane.” (r.14)

“heta niha berpîrsiyariya galegalên dîrûdirêj ne girtiye. Hertim bi zimanekî kurt beşdarî şorgermîya mêrê xwe bûye, di mijarên evîn û bextewariyê de hertim ruyê wê soromoro bûye.” (r.18)

Gava digihîjin gundê ku diçinê, Mamoste Kevanot, weha behsa vî gundê ku ew ê lê bibe mamoste dike:

“Binêre va em hatin... em hatin Gundê Dînan (...) wusa dibêjin. Min jî ji devê xelkê bihîstiye... Dibêjin, ev hemû gundên hawurdor jî vî gundê ha weke Gundê dînan bi nav dikin. Lê ciyekî xweş e, pir xweş e!... Ava wî rez û bîstanên wî, pîvazên... ha, ha, ha!... Tu dizanî, Nergis?... Dibêjin dînbûna şênîyên vî gundî, jî pîvazên wan e. Hinek jî dibêjin ji ava wan e.” (r.12)

Kevanot, berî ku were vî gundî li mamosteyê vî gundî yê berê rast hatiye û ji wî jî guhdarî kiriye. Mamosteyê vî gundî yê kevin şîret li wî kirine jî Kevanot di ser guhên xwe re diavêje. Mamosteyê din weha ji wî re behs kiriye:

“Bila ev temîya min li te be, Kevanot, Bila hertim hefsarê şênîyên vî gunda di dest te de be, zêde guhdariya wan neke, di ber devê wan re nekene û rû nede wan. An ne... tu ê av û av biçî, bibî nola wan û tu ê jî dîn bibî!” (r.13)

Lê li gora Kevanotî, ew mamosteyê kevin *“hinekî ji serê xwe çelq bû”*. Ji ber ku Kevanot berî vê hatina xwe bi çend rojan ji bo anîna mala xwe hatiye vî gundî, hin fikirên wî jî li ser şênîyên vî gundî hene.

“(...) zarokên gund hatin alîkariya min. Hemû jî gelekî baş bûn. Erê min dê û bavên wan, an jî ji rîspiyên gund kesek ne dît, ez zêde bi kesekî re ne peyivîm lê... lê min ji hêminiya wan derxist ku zarok ji merivên baş de ketine.” (r.13)

Mamoste Kevanot, bi hêvî ye û naxwaze bawerî tişteki din bike. Ev yek di peyva wî ya ku gava li ber dîwarê hewşa dibistanê disekine ji jina xwe re dike re dixuye.

“Ez baş dizanim ku em ê jiyanêke xweş li vî gundî derbas bikin. Tu tew xeman nexwe!” (r.13)

2

Mamoste Kevanot û jina xwe bi alîkarîya şênîyên gundî ku tene pêşîya wan û xêrhatinê li wan dikin bi cih dibin. Gundî ji bo hatina mamosteyê nû amadekarîya xwe dikin û êvarî xwarinê jî

ji wan re dibin. Kevanot jî diçe odeka gund û bi wan re sohbet dike. Şênîyên gund, di vê roja yekem de, îmajeke baş li ser wan dihêle.

“Xwîñşêrîn in, xwîngerm in, baş in, merva ne, şorgerm in...” (r.17)

Di biniya vê rûpelê de Kevanot bi peyveke ku wek dubarekirinê dixuye, heman fikirên xwe ji jina xwe re dibêje.

“(...) ev xelkê vî gundî ji yên bajarî comertir û mervatir in. Dilê wan germ û... germ û paqijtir in.” (r.17)

Lê, elbet Kevanot di nav şênîyên gund hin tebîtên nebaş jî dîtine.

“Ku meriv li wan xwedî derkeve û bi zimanê wan bipeyive, ji meriv re dibin... dibin erd. Lê... (...) Lê... nezan in, kwîrfam in, Serê wan hişk û hişê wan zû bi zû di ber tiştan de naçe.” (r.18)

Mamoste Kevanot hê nû çav li vî gundî û şênîyên wî ketiye, lê dîsa jî dilê wî bi hêvîyeke xurt lê dide.

“Lê em ê li vir jiyanekê xweş li dar bixin, Nergis. Em ê bi xelkê gund şêrîn û ew ê jî bi me xweş bin.” (r.18)

Ev gundê ku bi navê “Gundê Dînan” tê naskirin, hê xwe bi temamî nîşanî mamoste Kevanotî û jina wî Nergisê nekiriye. Lê hêdî hêdî, tevgerên Kevanotî bi xwe jî ne weke yên mamosteyên berê ne, bi herkesî re dikeve sohbetê, bi wan re dipeyive, bi zarokên re bi nêzîkî û hezkirinê aleqadar dibe û ev yek ji aliyê gundiyan ve jî tê dîtîn. Hê roja yekem mamoste radibe diçe dibistanê û bala xwe dide zarokan, kêfa xwe tîne û xwe amadeyî mamosteyê baş dike. Pîremêrekî gund, ku navê wî Sofî Sevdîn e, gava ku mamoste bi dilovanî bi keçîka wî ya ku mar pê ve daye re dadikeve, heta wê dibe bajêr, nexweşxaneyê jî, li ser wî weha difikire:

“(...) do dema li ber dîwarê hewşa dibistanê li halê wî pirsî bû, pê re ketibû galegalê, ew wê çaxê tégêhişti bû ku ev mamostê ha nefspiçûkekî maqûl e, lê dîsa jî hişê wî nagire ku karmendekî mîna mamoste, çawa bi gundiyeke wekî wî re dikeve têkîlyeke wusa germ (...).” (r.29)

Roja duyem, dîsa mamoste Kevanot diçe dibistanê, lê hê nû şayesa dibistanê ku divîya di serî de bihataya kirin, bi kurtasî tê kirin. Mamoste ji ber bûyera do dixwaze hin şîretan li zarokan bike û bi wan bide zanîn ku divê mirov destê xwe nexe qulên dîwaran. Ji zarokan dipirse bê ji bo çi destên xwe dixin qulên dîwaran, lê zarok bersivên ecêb didine wî.

“(...) ji bo girtina çêlikên çûçikan (...) hêkên wan derdixin û pê dilîzin, tew carina ji bo kêfxweşiyê hêlînên çûçikan ji hev dixînin, ne tenê çûçik, herweha ew bi şev jî dadikevin newalan, bi beqan digirin, lingên wan bi hev ve girê didin û li ser serî darde dikin, bi ro li nav erdan kûsîyan berhev dikin, bi kevirên mezin lê dixin, dikujin, perçe dikin, bêrika wan ji hev derdixin û ji diya xwe re dibin.” (r.34)

Wekî din mamoste Kevanot di dersxaneyê de lê wardiqile bê dêyên van zarokan bi wan bêrikên kûsîyan çî dike.

“(...) dibîne ku ji risasê perçekî piçûk, kespîkek, du pelikên zêrîn, moriyekê hespan, ji paçîkekî kesk nivîşteke piçûk, darîkekî duneçel û perçek hestiyê sêgoşe; hemû bi hevdu ve hatine girêdan û weke gulîkekê li ser girîka piyê zarok hatiye fîrketkirin (...) têdigihêje ku ew hestiyê piçûk î sêgoşe hestiyekî kûsî ye û bêrika ku tê gotinê jî ev e (...).” (r.34-35)

Mamoste Kevanot lê dinihere ku ev yek ji adetê derketiye, ji lewra ji xwe re dibêje, *“baştir e ku ez vê pirsgirêkê bi dê û bavê zarokan re bipeyivim.”* (r.35)

Lê piştî ku zarok jê re behsa listika “berberano” jî dikin, ku di vê listikê de zarok dibin beran û xwedîyên wan jî bavên wan bi stuyên wan digire û wan bera hev dide, serên wan li hev dixê, Mamoste Kevanot êdî xwe nagire. Hefteyekê li ser rewşa zarokan dikeve ramanan, li rê û metodên gotinan digere ku ji gundiyan re behs bike. Carekê diçe odeka gund û bi gundiyan re dipeyive jî. Ji wan re behsa giringiya zarokan dike û bi wan dide zanîn ku hin tebîetên zarokan yên nebaş ku ji aliyê dê û bavên wan ve jî tê zanîn hene û ji bo rastkirina vê rewşê alîkarîyê ji wan dixwaze. Kevanot li wê civatê Gebranê Baço yê ku xwendina bilind kiriye jî nas dike. Gebran jî mîna Kevanotî ji ber van tebîetên gundiyan aciz e û gelek caran rexneyan li wan digire. Erê, şênîyên “Gundê Dînan” heq didin peyvên mamoste, lê bersiva gundiyeke bi navê feqî Dimso ya li ser gotineke Gebran, hişmendîya gundiyan baştir derdixe holê.

“(…) Zarok in... ku kûsîyan jî nekujin, çi bikin, ma hevdu bikujin? (...) ew ê kûsîyan bikujin, ew ê li pey majîrokan jî bibezin û gumgumokan jî bikujin... bila wekî din tiştên xerab nekin, bila bikujin!” (r.46)

Belê, mamoste Kevanot, hêdî hêdî şênîyên vî gundî nas dike û bi alîkarîya Gebran jî ew ê çêtir nas bike. Gebran ji bo ku bala mamoste baş bikişîne, jê re behsa gundê xwe dike.

“Armanç û babetê gotinê çi dibe bila bibe... tiştêkî ku heta niha li vî gundê ha bi kar ne hati be, cî nagire û nayê pejirandin jî (...) wan ne hay ji xwendina zarokan, ne jî ji rewş û rihetiya zarokan heye.” (r.50)

Lê digel hemû peyv û şîretên Gebran yên reşbîn jî, Kevanot bersiveke weha didiyê: *“ji bo ku meriv wan serwextî tiştêkî bikin divê meriv dakeve pîvana wan.”* (r.50)

Lê Gebran gundiyan xwe baş nas dike. Gava lê dinihere ku Kevanot hay ji rastiya nîne, jê re weha dibêje.

“Ku tu dakevî pîvana wan, bawer bike tu ê li wira bimînî... bi gotineke din, tu ê di pîvana wan de bihetikî, xoce...tu ê di pîvana wan de bifetisî û biçî. Di pîvan û dunyayên wan de ev kuçên gund ê li te teng û zirav bibin (...) tu ê bibînî ku di kuçan de, di hewşan de, di penceran de çawa serê xwe dirêj kirine, weke cin û pîrebokan li rewşa te dinêrin. Bi kurtebirî, ev kuçên vî gundê ha ê li te bibin labîrenteke cinan û tu ê ji nav dernekevî... ew pirsgirêkên di serê te de... ew ê bibine girêkên şeytên û tu ê nikani bî vebikî... a wê çaxê... ew ê tinazên xwe jî bi te bikin û bikenin... Ew ê te dîn bikin û weke min berdin çolan.” (r.51)

Lê ew çi bibêje jî, mamoste Kevanot ji ya xwe danakeve û hêvîya xwe qut nake.

“(…) ez ê dîsa jî ji wan nerevim, ez ê li ber xwe bidim û nola hunermendekî têkevime nav wan, rengên nû, rengên baş û çêtir pêşanî wan bidim.” (r.62)

Kevanot îdealîst e. Gebranê ku bêtir realîst dixuye dike û nake, Kevanot ji ya xwe danakeve. Hingê ew jî peyva xwe ya dawîn dike û hin notên xwe yên ku li ser vî gundî hatine nivîsandin bi mebesta ku alîkarîya bi wî bike dide Kevanotî.

“Li vî gundê ha du jiyana li ber te ne, xoce. Yek jê jiyana van gundiyan e, ya duduyan jî jiyana te bi xwe ye (...) fermo, ez vê destnivîsa xwe bidime te û tu bixwîne. Hêvîdar im ji bo têgehîştina vî gundî û van şênîyan piçekî alîkarîya te bike.” (r.62-63)

Xwendevanê romanê bi xêra vê destnivîsa ku Gebran dide Kevanotî, hê nû “Gundê Dînan” hebekî nas dike. Ji ber ku heta niha hê tu şayesa gund, ji bilî hin dîmenên ku ji alîyê Kevanot û jina wî ve hatine dîtin ku têra şayesa vî gundî nakin, nehatiye kirin.

“(…)gundê me bi heftê avahîyên xwe ve, di navbera çiyakî jêrîn û yekî jorîn de mexel ketiye. Gundê me ji dûr ve xwedîyê dîmena gundekî nola hemû gundan e. Jora wî rez û weke hersal jêra wî jî bîstan û pîvaz e. (...) ji çar sed û bîst şênîyên gundê me bi kêmanî heşt kesên wan har, dehê wan dîn, bîstê wan cinî, sedê wan ehmaq, du sedê wan saxik... û yên mayî ne diyar in.” (r.68)

Gebran di vê destnivîsa xwe de mal bi mal behsa şanzdeh malên ku di nav şênîyên Gundê Dînan de gelekî tîn naskirin û ji bo baştir naskirina vî gundî pêwîst in dike û weke ku ew jî di serî de dibêje, *“bi etîketên ku wan bi hevdu ve zeliqandine”* an jî bi *“rengdêrên genî”* behsa wan dike.

“Mala dînan, Poznîkal î gavan, mala simbêlboq, mala donjuan, mala doxînsistan, Kûpo, Çavbeloq, Hecî Nîvçe, Fîrquz, Cefto, mala şeytên, Fîstûj, Sofî Kurmî, Rîsor, Gendo, Rîço...” (r.65-103)

Di romana Labîrenta Cinan de beşê herî xweş ku kêfa xwendevanên wê jê re bêt jî ev beşên ku wek destnivîsên Gebranî hatine dayin û bi zimanekî di eslê xwe de hêrsbûyî, lê qerfî hatine nivîsandin in. Hesenê Metê di vî beşê ku sîh û neh rûpelan dewam dike de hemû zanebûna xwe ya li ser kultura gundîyan û henekbêjîya xwe bi kar anîye û herweha jî di ravekirin û danasîna vî Gundê Dînan de bi awayekî ecêb bi ser ketiye.

Hin nimûneyên ji vî beşî:

“mala Poznîkal î gavanê gundê me (...) ji bo keç û xortên gundê me ciyekî stratejîk e. Lewra xortên dildar tîn mala gavanê me, di wê pencerê re li keçan dînerin. (...) dest û destmalên xwe ji wan re dileqînin û tew carina di vê pencerê re neynikê jî didine çavên wan. Ji ber vê yekê ye ku di bêrikên hemû xort û heşaşên gundê me de hertim neynikek peyda dibe.” (r.69)

“Fîrquz û nerindên (fîrquz û nerindên gundê me pir in) gundê me bi vî xwî û tevgera Hecî Nîvçe dizanin.” (r.76)

“Pirî caran xortên gundê me diçin ba Cefto, gilî gazîneke (gilî û gazinên hemû xortên gundê me kêm zêde wek hev in) weha dikin...” (r.79)

“(…) êdî hûn bi xwe navekî li vê malê bikin. Ji ber ku li ser vê yekê şênîyên gundê me jî li hev nekirine.” (r.82)

“(…) li gundê me merivekî baqil di dawîya dawîn de dîn dibe, merivekî ji Xwedê re piştî demekê dixerife û li hemberî Xwedê asê dibe, merivekî dewlemend xizan dikeve...” (r.96)

“(…) parsekek li derîyê malên gundê me bixin, bêguman bi destên vala venagere. Lê ev mala ha ne wusa ye. Dema ku qereçî tîne vê malê, zarokên vê malê dikin ku ew tiştêkî ji qereçîyan bigirên. Di şevên îniyan de şîva miriyan dernaxînin, dema ku jina gavanê me diçe şîva gavanan, ew dibêjin, du kufte zêde ne û yek jî hindik e. Her weha kuftekê bi du ciyan dikin û yek û nivê didin mala gavanê gundê me.” (r.99)

“gotina ku dibêje: şêr şêr e, çi jin e çi mêr e, li gundê me cî jê re tune ye. Bi gotineke din li gundê me: şêr şêr e, jin jin e û mêr jî mêr e.” (r.101)

“Li kujekî bakurê gundê me maleke... na ev ne mal e... ne mal e, ne kon e, ne şikeft e... ecêbeke giran e... endamên wê ne ji ademîyan e, ne ji asîmanîyan e û ne jî ji cin û pîrebokan e... doxînê di tengala pişta xwe de dişidînin, zikê xwe piçûk dikin... ji bo ku birçî nebin, gûyê xwe nakin...” (r.103)

4

Sê sal di ser hatina Kavonotî re derbas dibin. Jina wî Nergisê, di van sê salan de bi hemû adetên xwe ve, rabûn û rûniştina xwe ve û heta kenê xwe ve jî dişibe jinên Gundê Dînan. Mamoste Kevanot jî, digel mamostebûna xwe, dişibe zilamên vî gundî, dikeve nava sohbetên wan, bi wan re şer dike, bi wan re qayişê dikişîne, êvaran bi wan re diçe nêçîrê û weke hemû gundîyên din bi hemû tebîetên gundîyan yek bi yek dizane û mîna wan tev digere. Weke ku Hoto jî dibêje:

“Ê... ev bû sê sal ku xoce ava gundê me vedixwe, ma hîn jî xwîyê me nagire?” (r.145)

Belê, Mamoste Kevanot êdî dişibe şênîyên Gundê Dînan. Hemû peyivên ku Gebran ji wî re gotine rast derdikevin. Kevanot, piştî şeveke nêçîr çûçikan û guhdarkirina meseleya Cindî ji nişka ve diguhere. Weke ku nivîskar jî dibêje:

“... bêkêfîya bêwext, îşev û aniha ji nişka ve girte ser mamoste Kevanot ji ruyê wî wenda nabe...” (r.161)

Guherîna wî ji aliyê gundiyan ve tête dîtin lê kes napirse bê çi bi wî hatiye:

“(...) dibînin ku ew hişk û zuwa bûye, gwînê wî zer û çavên wî beloqî bûne, mîna ku destên xwe ji tiştêkî veşêre di nava şeqên xwe de dane ser hev, bêdeng e, dipê.” (r.161)

Sawek bi Kevanotî re peyda dibe ku ew di serî de lê hay nabe, lê bi dû re gava diponije û xew nema dikeve çavên wî, li xwe hay dibe ku rewşa wî nebaş e. Ditirse, vedirişe û ji jina xwe dixwaze ku lampê venemirîne. (r.163-164) Wî şevê nikare ji jina xwe re behs bike bê çi hatiye serê wî. Devê wî tev nagere, ji ber ku ew jî bi temamî nizane bê çi bi wî hatiye. Wê şevê dapîra wî ya mirî tê ber çavê wî, dengê wê dibihîze. (r.167) Dixwaze ji jina xwe re behs bike, lê jinik bawer nake û dibêje qey xewn e. Jina wî li cem xwe dibêje *“Ev mêrikê ha îşev dîn dibe.”* (r.167)

Guherînên di nava Kevanotî de qonax bi qonax heta ku Sevdînê Selîm li wî rast tê dewam dikin. Kevanot xemsar bûye û bi awirên vala li derdora xwe dinihere. Sevdînê Selîmê ku ji rewşa wî tê derdixwe ku tiştêkî nebaş hatiye serê wî, dixwaze bi sîleyekê wî bîne ser hişê wî, lê Kevanot piştî wê sîleyê jî êdî dikeve erdê û bi tayê dikeve. (r.171-172)

Bi vî awayî gundî giş bi rewşa Kevanotî dihîsin û di nav xwe de li ser wî dipeyivin.

“Ji me çêtir, bi ber bayê wan pîrozweran ketiye.

Ji me çêtir, bi cinan ketiye.”

“Bi hepûlepê ketiye.”

“Dîn bûye.”

“Ev tişta ji nişka ve bûye û...” (r.173)

Belê “dînbûyina” mamoste Kevanotî bi vî awayî deng dide. Gundî dikin û nakin jê re çareyekê peyda nakin, li ser wî dixwînin, kaxezan jî re çêdikin, dixwazin alî wî bikin, lê bi kêr nayê.

“Şênîyên gund serwext dibin ku êdî bi kêrî karê xwe, bi kêrî hîndayîna zarokan nayê, destên xwe jê dişon, lê dîsa jî dipên (...)” (r.192)

Lê Kevanot nabe Kevanotê berê ku ew hevî dikin û êdî tevgerên wî bi temamî têne guhertin. Bi gundiyan re şer dike, dev li xwe û xelkê dike ku êdî ev rewşa wî bi temamî di nav xelkê de olan bide û bigihîje deverên dûr jî.

“(...) ev rewşa ha ji wir, ji nava gund û şênîyan derdikeve, digêhije nexweşxanan, digêhije bajarên dûr û karmendên destê yekem pê dihîsin.” (r. 197)

5

Romana Hesenê Metê ku çîroka mamoste Kavanotî ya balkêş rave dike, ji rastiya gundiyan kurd dest pê dike û teva rastiya mamosteyekî îdealîst dibe ku weke bûyer nakokîyên xurt ya di nava civata me de temsîl dike. Ji aliyê teknîkî ve, Labîrenta Cinan, baş hatiye hûnandin û konsantrekirî dixuye. Lê digel vê yeka ku ji bo romannivîsî biserketinek e, lezandina di nava bûyeran de û sînorên sebra nivîskarî ya ku di navbera bûyerên ravekirî de gelekî diguhere, gelek caran romanê ji forma romanê bi dûr dixîne. Dibe ku ji ber vê sedemê nivîskêr bi xwe jî li ser çapa wê ya yekem “novel” daye nivîsandin. Lê di çapa vê romanê ya duyem ku li Stenbolê hatiye kirin de ev yek hatiye guhertin û wek “roman” hatiye nivîsandin.

Di herdu çapên romanê de hin hêlên ku qet nehatine guhertin, lê bi xwe, wek xeletiyên rastnivîsandina kurdiyê ber bi çav ve dikevin jî hene.